# Diyalog bi marjînal

»»» R:6



# Divê kûrahiya strate-jiya me hemû gelê Kurdistanê be

»»» R:2

# Avakirin û yekîtiya neteweyî di Kurdistanê de

»»» R:3

# Desthilata reha

»»» R:5

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (451) 08-06-2023Buha (1000) Tûmen*

# Pêşwaziya Gelawêjê

Meha Gelawêjê bi rojên taybet ên xwe ku bûne parek ji dîroka xebat û tevrêra rizgarîxwaziya gelê kurd, meha bîranînên pîroz ji bo me bûye û bûye meha kelemê nav çavê dujmin û neyarên gelê Kurd.

Bitaybet Gelawêj bo xelkê Rojhilatê Kurdistanê re naveke gelek taybet û hezkiriye, li ber vê ku di Gelawêjê de ku Hizba wan a pêşengê xebat û tevgêra rizgarîxwaz, anku Hizba Demokrat hatiye avakirin.

Di Gelawêjê de evîndarên rê û rêbaza wê Hizbê hertim xwe amade kirine ji bona pêşwazî û pîrozkirina herî germ. Seranserî Rojhilatê Kurdistanê hemî salê di meha Gelawêjê de şewq dide û germahiya wê şewqê kela dîktator û dujminan dilerzîne.

Ger em amajeyekê bi vê hilkevtê bikin ku bê guman tu kes li Rojhilatê Kurdistanê nine ku haya wê munasibetê nebe, lê dîsan jî hewce ye ku bê baskirin.

Di roja 25ê Gelawêja sala 1324an de Hizba Demokrat weke partiyekî netewî-demokratîk li ser bingeha J.K hate avakirin, di rastî de Hizba Demokrat bi hinek guhartin li nav û pêkhata J.K ê ji dayîk bû, û Hizba Demokrat hemen J.K e ku di sala 1321an de li ser destê hin xebatkar û kesayetiyên




netewî û xwedî pêgeh ên Kurdistanê hat danîn û her hemî xebatkar û endamên damezrênerên J.K bûn ku PDKÎ avakirin. Wate tenê di sala 1324an de guhartinek bi ser navê wê rêkxistinê de hatiye û endam û avakerên wê heman endamên J.K bûne û armanc û daxwazên siyasî û netewiye wê heman daxwaz û armanca J.K bûne, ku wisaye baştire bê gotin ku Hizba Demokrat di sala 1321 an hatiye avakirin, gelek sirûştiye ku di dirêjiya wan 80 ê salên derbasbûyî de gelek guhartin bi ser taktîk û dirûşm û pêkhata wê Hizbê de hatibin ku guhertina J.K ê bi Hizba Demokrat a Kurdistanê jî yêk ji wan guherînane.

PDKÎ di heyamê 80 salên boherî de li pêxema gihîştina bi wan armanc û daxwazên netewiye ku li ser wê bingehê hatiye avakirin, gelek nirxên giran dane, Hezaran Pêşmerge û endamên wê Hizbê li pêxema armanc û berjevendî û parêzgarî ji axa Kurdistanê û gelê kurd canê xwe gorî kirine, dehan endamên rêberiya wê Hizbê û serweyî hemiyan Pêşewa Qazî mihemed yekem serok û avakerê wê hizbê, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî Sekertêrên wê Hizbê pêşengê canliserdestî û fidakariyê bûn ji bona serxistina armancên gelê Kurd û Hizba xwe, û şehîd bûne.

Hizba Demokrat di hemî heyamê temenê pir serfiraziya xwe de, mezintirîn xweşnavî û pêgeha herî bi hêz di nava gelê xwe de hebûye ku pareke ji vê pêgeha mezin û xweşnaviyê vedigere bo ser heman fidakariya endam û pêşmerge û Rêberên wê Hizbê bona bidestve anîna daxwazên gel.

Pêgeha yekem a Hizbê di nava gel de vedigere bo siyasetên serrast û usûlî û sedaqeta di gel xelkê.

xweşnaviya wê Hizbê vedigere bo mukumî û micidiya li ser berdewamiya xebatê. Pêgeha bi hêz a vê vedigere bo vê ku hemî endam û rêberên vê parek ji Kur û Keçên heman wî xelkî ne û ji çi cihekî din û bîhanî nebûne. Xalên pir şanazî yên mezin bûn û xwedî bandor bûn û xwedî pêgeha berfireh a wê Hizbê di nava gelê kurd li Rojhilatê Kurdistanê gelek in, û ji hejmar nayên û renge di kurte gotarekî wiha de cih nebin.

Lewma, em dibînin ku hemî salê di meha Gelawêjê de li seranserê Kurdistana Îranê de, gel bi hilkevta salvegera avabûna Hizba Demokrat kar û çalakiyan dikin û pîrozkirina wê yadê bo xwe kirine parek ji kultûra xwe.

Ku wisaye piştî derbasbûna 80ê salan roj bi rojê zêdetir PDKÎ xweşnavî, xwedî pêgehtir, bi bandortir di nava gel de ye, û bûye felsefa jiyan û cand û berxwedanê.

**Pîroz be 25 ê Gelawêjê salvegera avakirina PDKÎ li xelkê azadîxwaz ên Kurdistanê û malbatên serfiraz ên şehîdan û hemî endam û kadr û pêşmergên PDKÎ.**

# Divê kûrahiya stratejiya me hemû gelê Kurdistanê be



**N: Dr. Mecîd Hekî**

Têkoşîna rizgarîxwaziya neteweya Kurd, têkoşîna azadiya welat û bidestxistina serweriya siyasî ye. Bi wateya rastîn têkoşînek sekolare. Bi gotineke din, her çend piraniya partî, rêxistin û saziyên sivîl ên Rojhilatê Kurdistanê partiyên "sekolar" in û ol weke amûreke siyasî bikar neanîn jî, lê neçar in ku kûrahiya stratejiya xwe diyar bikin. Kûrahiya stratejîk a her tevgerê divê avahî û ferdên civaka ku ji bo wê têdikoşe bin.
Kurdistan gulistan a ol û kevneşopiyên cuda yên olî ye. Her wiha li Kurdistanê Azerî, Ermenî û Suryanî jî dijîn ku beşek ji gelê Kurdistanê ne. Rizgariya Kurdistanê tê wateya rizgariya wan û rêzgirtina ji bo hemû mafên wan ên ku di danezana Neteweyên Yekxbûyî de hatine destnîşankirin.

Têkoşîna rizgariya Kurdistanê bi awayê dîrokî li herêma Urmiyê û Mukriyanê dest pê kir û piştre li deverên din belav bû. Piraniya kurdên van deveran sunnî ne. Ji ber vê yekê, bi kevneşopî û nerîtî, her çend partiyên kurdan laîk bin jî, laîkiyeke sunnî ne. Berhema çandeke wiha bûye hesta ferqkirina civaka Yarsanî di nava bizava netewî de û di nav wan de partiyên Kurdistanî û cudabûna gelek çalakvanên Yarsanî ji partiyan û damezrandina partî û rêxistinên taybet bi civaka Yarsanî.

Taybetmendiya civakên helweşa û şikestî ew e ku di nav beş û komên cuda de hatine dabeşkirin, bi darê zorê wek cama (şîşe) pelçiqandî bi hev ve hatine zeliqandin û bi ferqeke herî biçûk ji hev veqetiyane. Ev yek rê dide dijber û biyaniyan ku bi hêsanî destwerdana karên navxweyî yên van civakan bikin, qeyranên navxweyî çêkin û wan bi civakên "seretayî " tawanbar bikin. Dagirkerên Kurdistanê di dema borî û îro de cudahiyên eşîrî, olî, mezhebî û heta zaraweyî yên Kurdistanê li dijî bizava rizgarîxwazî ya neteweya Kurd bikar anîne û di vê siyasetê de heta radeyekî mezin bi sedema şikestina civaka Kurd bi ser ketine. Şoreşa "Jin, Jiyan û Azadî" rewşek nû afirand ku tê de cudahî ne tenê xeternak e, di heman demê de dibe sedema yekîtiyê. Heger berê navenda bizava neteweyî tenê herêmên sunnî yên Kurdistanê bû, îro



qada têkoşîna netewî li hemû herêmên Kurdistanê belav bûye û heta Kurdên ku li derveyî Kurdistanê dijîn jî xwe beşeke girîng a tevgera neteweyî ya Kurdistanê dibînin.

Civaka Kurd di sedsala ragihandin û torên civakî de ji ber siyaseta parçekirina dijberên Kurdistanê, rûbirûyê metirsî û parçebûnê herî mezin e. Têgihîştina civakî pêdiviya civaka kurdî ya îroyîn e, ku tê wateya zanîn û pisporiya çawaniya lihevkirina cudahiyan di çarçoveya xewnên hevpar de.
Tevgera rizgarîxwaz ji bo biserkeve û bigihêje armancên xwe divê tevdeger be. Cudahiyên di civakê de nas bikin û rêz ji wan cudahiyan bigirin. Cudahiyan bikin bingehê xurtkirina nirxên hevpar û di heman demê de van cudahiyan wekî dewlemendiya çandî û civakî ya neteweyê bihesibînin. Civaka Rojhilata Navîn di qonaxeke hestiyar re derbas dibe, di demeke rûbirûbûna nirxên tundrew û dijber de derbas dibe. Di rewşeke wiha de wê bawerî û polîtîkayên ku li hemû nirxên civakî yên kolektîf xwedî derkevin û nebin hêzeke îdeolojîk a yekalî û nûnertiya çîneke civakî ya taybet a Kurdistanê bi dest bixe. Naskirina cudahiyên Kurdistanê dibe alîkar ji bo bihêzkirina nirxên hevbeş ên ku civaka Kurd bi hemû pêkhateyên wê re li dora armanceke hevbeş digihîne hev. Pêşketin nayê wateya berevajîkirina baweriyên mirovan, belkî afirandina jîngeheke aştiyane û berfireh e ku hemû mirov tê de xwe di ewlehiyê de hîs bikin û ne di bin metirsiya biçûkbûnê de bin.

Saman û sermayeyên civakî yên gelê Kurd xwedî derfet û potansiyelên xurt ên yekîtiyê, xurtkirina hesta hevpariya neteweyî û xurtkirina yekîtiyê bi mekanîzmayên demokratîk. Dem hatiye ku em cudahiyan li dora xalên hevpar bînin cem hev û cihêkariyê di hemû astên çanda xwe ya siyasî, rêxistinî û rewşenbîrî de ji holê rakin. Cudakariya nedîtbar ji cudakariya eşkere zêdetir dikare bibe sedema perçebûna civakê. Tiştekî ku rejîmên dagîrker di demên borî de bi awayekî xweş "kontrol kirine" û her ku pêwîst be li dijî tevgera netewî bikar tînin. Îro ji her demê zêdetir pêwîstiya me bi avakirina pirên baweriya civakî û têgihîştina siyasî û civakî heye, ku tê wateya berfirehkirina asoya siyasî û bihêzkirina kûrahiya stratejiya xwe ya netewî.

# Peyama pîrozbahiya PDKÎ li hilkefta yekgirtina Partiya Azadî a Kurdistanê û Tevgera Demokratîk a Kurdistanê

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bo yekgirtina Partyia Azadî ya Kurdistanê û Tevgera Demokratîk a Kurdistanê peyama pîrozbahiyê şand.

**Deqa peyamê wiha ye:**

**Birêz Birêveberiya Hevbeş a: Partiya Azadî a Kurdistanê û Tevgera Demokratîk a Kurdistanê**

**Silav û rêz**

Bi keyfxweşî ve, daxuyaniya yekgirtina we di rêkxistinek nû de gihîşte me. Ev pêngava siyasî û dîrokî a we, peyamek girîng e ji bo yekîtî, biratî û hevxebatiya zêdetir a part û aliyên siyasî ên Bakûra Kurdistanê.

Em bi navê Nawenda Birêveberî a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê ve pîrozbahiyên herî germ ên xwe pêşkesî we dikin û hêviya serkevtinên zêdetir di xebata ji bo bicîhatina armancên siyasî û netewî ên gelê me ê Kurd di Bakûra Kurdistanê de dixwazin.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di vê baweriyê de ye ku rizgariya nîştiman ji dest dîktatorî û kevneperestiyê, tenê bi yekîtî û tekoşîna xebatkarên gelê me û




piştewaniya gelê me ê mafxwaz û berxweder misoger dibe.

**Pîroz be yekgirtina we**

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**

**Nawenda Pêwendiyên Giştî**

**Mihemednezîf Qadirî**

# Avakirin û yekîtiya neteweyî di Kurdistanê de



N: Serbest Urmiye

Di rojên borî de û bi hilkevta hatina roja 10'ê meha Muherrem'ê ku ji aliyê bawermendên mesebê şiie - ku beşek gelê Kurd û hejmarek ji niştecihên Kurdistanê jî bawerdarê mesebê han in- bi "Aşûra" anku salvegera Kuştina Îmam Husên, îmamê seyemîn yê Şîian, hatiye navkirin , peyameke hevxemî yan sozdariyê li ser pêgeha "Twitter"ê ji aliyê berpisê Giştî yê Navenda Birêveberiya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, birêz Mistefa Hicrî, ve hate weşandin. Piştre peyama han di terzên cuda de bi baş û xerab hate şirove û nîqaşkirin û hevbîr û cudabîr jê derketin.
Di vir hewil tê dan ku peyama han weke girîngî û hewcehiyekê ku dibû bi xasmanî di qada neteweyî li Kurdistanê de ji mêj ve hewil jê re hatiba dayîn were şirovekirin. Herçend ku niha jî bi taybetî piştî serhildana ku bi navê "Jîna" û bi silogana "Jin, Jiyan, Azadî" di Kurdistanê de, hewcehiya wê ji bo yekîtîya neteweyî û civakî li hember rejîma dagîrker de berçav e.
Di destpêkê de hewil tê dan ku li gorî têgehen netewesazî û yekîtiya neyeweyî werin şirove kirin û di Kurdistanê de werin berawird kirin.

**1. Avakirina Neteweyî**

Têgeha netewe bi wateya gel û niştecihên welatekê, bo cara yekem di şoreşa Fransayê de serhilda. Ji ber ku şoreşa han serhildan li dijî çarçoweya hevwelatîbûna tac û textan û derbazbûn bo hêlek berfirehtir wate hevwelatîbûna Firensî bû.

Netewehezî weke pêvajoya afirandin û bingeha pêkhatina neteweyan, ramaneke siyasî ya berfireh e û ji aliyê teorî ve bi qasekê mend e ku dikare navenda li hevnezkirina bîr û hizrên cuda û dijberî hev be.

Her çend ku di pênaseyên kilasîk de netewe demekê wateya xwa ya rast werdigire ku dewlet - neteweyek pêkanî be .

Lê dîsan jî avakirina neteweyan girîngtir e ji avakirina dewletê. Netewe ji aliyê siyasetvan û rewşenbîrên neteweperest ve tên afrandin û çîn û texên civakî, aborî û siyasî û ... yên ku ji vê pêkhateyê mifahê werdigirin, piştîvanên vê pêvajoyê ne. Lewma hewce ye ku di pêvajoya avakirina neteweyan de hemû pêkhate , nemazê di aliyê civakî de bên serhev xistin.

**2. Yekîtiya neteweyî**

Ya ku herî zêde di avabûna dewletên nûjen de xwedî bandor e û di pêşketina dewletan de weke gava sereke tê dîtin yekîtiya neteweyî ye.

Di pirsa yekîtiya neteweyî di avakirina neteweyan de jî yek ji pirsên herî sereke ji demokrasî û azadiya derbirînê, girîng dayîna nêrîn û bîr û baweriyên cuda û pêkanîna deliveya hewce ji bo guhertina tevalî ya bîr û rayan roleke bingehîn dibîne.

Rast e ku yekîtî di navbera endamên neteweyekê de esasê pêkhatina yekîtiya neteweyî ye, ji aliyê din ve jî pêkanîna yekîtiya neteweyî armanca partiyên siyasî ye.

Partiyên siyasî navendên sereke yên civîn û yekgirtina bîr û îradeyên cuda ne, ku derfetê ji bo bandor danîna hêzên siyasî û civakî li ser hev û li ser pêkhateyên din ên siyasî diafirîne.

**3. Avakirin û yekîtiya neteweyî di Kurdistanê de**

Di berhevdan Payama birêz berpirsiyarê Giştî yê Navenda Birêveberiya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê weke hêzekê ku hilgirê nasnameya neteweyî û berfireh di Rojhilatê Kurdistanê de, tevî fakterên ku di serve hatin bas kirin, hewcehî û girîngya peyama han derdikeve. Eva di demekê deye Ku Partiya navbirî hertim di bone û resmêm aliyên din yên civaka Kurdistanê de jî xwedî peyam bûye.

Kêmasî di gotar û yekîtiya neteweyî di Kurdistanê de yê bûye sedema paşvemayînên zêde. Heya di serdemê pênaseya kilasîk ji netewehezî(nationalism) de jî ku weke pirseke girîng û bi bandor dihate mêzekirin û dewlet-netewe wekî çareseriya pirraniya qeyranên siyasî- neteweyî ne tenê li herêma me de, belku di cîhanê de jî dihat dîtin, nebûna pênaseyeke zanistî ya bihêz û berfireh ji netewehezî(nationalism) a Kurdî , him di warê selimandin û him jî di warê redkirinê ji aliyê hêzên siyasî yên kurd ve, ne tenê nekarî pirsa çarenivîsa gelê kurd ku bi salan qurbanî jê re dida , çareser bike , belku di hin qonaxên cuda de rewşek afirandin ku mixabin aliyên Kurdî heta di rûyê hev sekinandin.

Ji aliyeke din kêmasiya zanistî di gorata netewehezî(nationalism) ê di Kurdistanê de bû sedem ku beşeke girîng ji pêkhateya sereke ya neteweya Kurd û xwe di gotara neteweyî ya Kurdî de nebîne û nasyonalîzma Kurdî paşve bikêşe. Wek mînak, Kurdên Êzdî li Başûrê Kurdistanê ji ber sedemên olî û Kurdên Lor li Rojhilatê Kurdistanê – ku li gor Kurdologên Kurd û bîhanî , beşeke in ji neteweya Kurd – û pareke mezin ji Kurdên ku bawermendê mesebê Şîie bûn heta çend salan berî niha jî, bûne qurbanîyên zanistî nebûna pênaseya netewehezî û gotara netewî ya Kurdî. Ji bilî vê çendê beşeke berçav ji xaka welat ji destê Kurdan derket(Loristan).

# Bê avî bûye pirisgirêkek micid bo xelkê devera Mirgewer

Krîza kêmbûna avê li bajarên Rojhilatê Kurdistan û Îranê bûye arîşeyek micid û niha xelkê devera Mirgewer yê girêdayî bajarê Urmiyê jî rastî vê pirisgirêkê hatine.

Pêka raporên belav bûyî li malperên xwecihî ev heyameke zêde ye ku welatiyên gundên devera Mirgewer yê girêdayî bajarê "Urmiyê" rastî bê aviyê hatine û ev yeka bûye pirisgirêkek micid bo ser jiyan û karên wan yên rojane.


Pêka wan raporan li hejmarek zêde ji gundên weke "Jarava, Sorkan, Bawa, Topzawa, Helec, Hêşmava, Filkan" û çendîn gundên din hin rojan bo heyama nêzî 10 demjimêran ava malan qut dibe û li hin ji wan gundan nîva şevê av tê ku xelk nikarin ti mifahekê jê werbigirin.

Herwisa hatiye belavkirin ku li gundê "Dizê" jî her roj av tax bi tax tê cîre bendîkirin û hin ji wan taxan bo çendîn demjimêran bê av dimînin.
Herwisa pêka zanyariyan welatî tenê bo ava vexwarinê rastî arîşeyan nehatine belkû bo karê werzêrî û avedaniya berhemên xwe jî rastî pirisgirêkan hatine û hin ji wan werzêran neçarin bi tankêran avê bikirin û dar û baxên xwe avedanî bikin û nirxa her tankêr av bo avedaniya bax û berhemên werzêriyê nêzî milyoû 500 Hezar Tûmenî ye.



Devera Mirgewer yek ji wan deverên Kurdistanê ye ku xwediyê çavkaniyên mezin yên avên şirûştî û keviyên befrê û kaniyên mezin e , lê bi sedema piştguh avêtina vê deverê ji aliyê karbidestên rejîmê û nebûna xizmetguzariyên hewce xelkê vê deverê neçarin di nava avê de bê av bimînin.

# Mijara yekîtiya praktîk a opozîsyonê ji bo derbasbûn ji Komara Îslamî



N: Babaelî Mêhrperwer

Ji dema ku mirov ketiye qada jiyanê, hêz û şiyana yekbûnê bi dest xistiye, lewma mirovên destpêkê bi hev re jiyane û karê nêçîrvaniyê kirine. Guman tune ye ku hêz di yekîtiyê de ye û berovajî vê yekê di dîroka mirovahiyê de tu carî nehatiye selmandin. Niha xelk li ser parzemîn, welat û neteweyên cuda hatine dabeşkirin û berî her tiştî pêwîstiya her welat û neteweyekê bi yekîtiya navxweyî û pişt re bi hevalbend û dostan heye ji bo ku xwe ji dijmin û dijberên xwe biparêze. Di dirêjahiya dîrokê de dijminan hewl dane ku yekitiya dijberên xwe bişkînin û di navbera wan de pevçûn û têkçûnan çê bikin.

Li vir em dê li ser mijara yekitiya pratîkî ya opozîsyona Îranê bisekinin. Li Îranê yasa heye û hêz jî di yekbûn û hevgirtîbûnê de ye. Mixabin di vê dema hestyar de ji bilî belavbûn û dijheviya dijberên rejîmê tiştek din nayê dîtin. Rast e her kes, kom û partî basa yekîtiyê dike, lê çima yekîtî bûye wek mirov û siya wê û mirov her diçe û nagihe sîbera xwe? Ji bo ku em bi hûrî li vê pirsê binêrin û li sedeman bigerin, divê em bizanibin ku opozîsyona niha ya rêjîmê kî ye û her yek ji wan xwedî çi taybetmendiyekê ye. Opozîsyona Îranê bi giştî dikare li ser çend koman were dabeşkirin:

Partî û Rêxistinên Rojhilatê Kurdistanê:

Ev rêxistin xwedî dîrokeke têkoşînê ne û di nava gelê xwe de cih digirin û li Kurdistanê xwedî erkên rêxistinî û endam û alîgirên xwe yên veşartî ne. Eva ji bilî hejmareke mezin ji endam û alîgirên diyar ên li derveyî welat wate dervey Îranê ye ku piraniya wan bi rêya partiyên xwe amade ne ku ji bo armanca netewî qurbanî bibin û tekoşînê bikin. Di pêvajoya Serhildana Jînayê de bi rêberî û banga Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistana Rojhilat bi bandor bûn. Tevî ku Navend ji hemû aliyan pêk nayê, lê partiyên kevnar ên Kurdan li xwe digire. Lewma jî gelên Îranê bi potansiyela xurt a Kurdan hesiyan. Rewşa niha xuya dike ku pêwîst e Navenda Hevkariyê bê xurtkirin.

Partî û rêxistinên neteweyên din ên Îranê:

Tirk, Ereb û Belûç jî xwedî rêxistinên siyasî ne û heya asteke hem bi hêz û hem jî çalak in. Ji xwe xuya ye ku Tirk ji ber sedemekê û yên Belûç jî ji ber sedemeke din xwedî taybetmendiyên xwe ne, ji aliyekê ve Tirk şîe ne û wek sunniyan cudahiya olî nabînin. Herwisa Tirk di bilindbûn û daketina aboriya welat de beşdar in. Ji ber hestên olî yên bihêz di nav Belûcan de, Mewlewiyên wir û bi taybetî kesayetiya Melewî Ebdulhemîd şûna partiyan girtin. Xutbeyên wî yên olî di nimêja înê de li bajarê Zahidanê û bajarên din ên Belûçistanê bûn sedema xwepêşandanan. Tevî van cudahiyan, potansiyela hevkarî û hevbendiyê di navbera van neteweyan de bihêz e û gelek xalên hevbeş di navbera wan de hene. Ji bo mînak di nav aliyên Kongreya Neteweyên Îrana Fêderal, curek hevpeymaniyê heye.

Partiyên çep:

Ji bilî partiyên çep ên Kurd ku di nava gelê Kurd de xwedî helwest û bandoreke nisbî ne, partiyên din zêdetir xwe di kesayetiyê de dibînin. Eşkere ye ku ev hejmar xwedî paşxana têkoşînê ye, lê ji ber ku li navxweyî Kurdistanê nîn in û ji ber qutbûna pêwendiyên wan yên rasterast bi welat re, bandora wan kêm e, heta grevên karkeran jî li ser hesabê wan nayê nivîsandin, ji ber ku sendîka û karkerên navxweyî pêşengiya wan dikin. Mixabin opozisyona çep a Îranê ku li Ewropa û li deverên din dijî, di nava toreke îdeolojîk de asê maye û ew bi hev re jî hevkariyê nakin. Ji ber vê yekê daxwaz û hizra wan ji hêz û şiyanên wan zêdetir e, ku ew jî rêgir e li pêşiya pêkanîna hevpeymaniyan ligel aliyên din ên opozîsyonê.

Komarparêz:

Ew piranî hin kesatiyên dervey Îran ne, her çend carinan bi navên cuda tên cem hev, lê ji ber ku pozîsyona wan di hundirê welat de ne xurt e, di serhildanan de tu bandorek wan tune ye. Eşkere ye ku ew kesatî, mirovên welatparêz in û di têkoşîna siyasî de xwedî dîrok in, lê ev jî têra rewşa niha ya welat nake. Her çend hemû neteweyên Îranê û hejmareke mezin ji xelkên Îranê bi rastî komargir in, lê ti partî û rêxistinek ku bikare vê potansiyela bihêz bi kar bîne û tevgereke bi bandor di hundirê welat de bide destpêkirin, tune ye.

Mucahidîn:

Rêxistineke xurt, bi disîplîn û xwedî dîroka têkoşînê û mîratgirên bi deh hezaran şehîdan in. Lê di heman demê de, ew rêxistineke girtî û îdyolojîk in ku ji bilî xwe û şaxên wan kêm hevalbendên wê di nav dijberên rêjîmê de hene. Mucahidîn xwe wek altêrnatîva rêjîma paşvero ya Îranê dibînin û rijd in ku bi rêxistinên din re hevalbendiyê bikin, lê merca wan ev ku partî yan rêxistinên din serweriya Mucahidînê qebûl bikin. Ev bi salan e ku Mucshidînê, kesek weke serokê xwe yê hilbijartî ji bo Îranê destnîşan kiriye. Mucahidîn bi bedelên mezin hewl didin di nav parlementer û rayedarên welatên Ewropa û Amêrîkayê de lobiyê bikin. Ev bixwe ne xerab e, lê pirsgirêkên opozîsyonê çareser nake. Ji ber ji bo opozîsyonê, berjewendiyên hevpar girîng in. Niha em dibînin ku welatên ku baş bi reftarên rêjîmê, terorîstiya wê û reftarên wê yên li dijî mafên mirovan hesiya ne, têkiliyên xwe yên dîplomatîk,

bazirganî û siyasî bi wê re didomînin. Tenê tişta ku ew pê dihesin, pêşxistina çekên etomî ye, ku ew ji bo xwe û hevalbendên xwe weke metirsî dibînin. Mucahidînê têlêvîzyonek hinek bi hêz heye ku wê partiyê, ji rêxistinên din cuda dike lê ewqasî bandora wan di di pêvajoya şoreşa Jînayê de tune bû ku girevê li bajarekî bi rêkxistinî bike.

Şaxwazan:

Rêxistin ya jî çend hevalbend nîn in, lê kom û grupên cuda ne ku tişteke wan a hevpar heye: şoreşa 1979'an weke şaştî dibînin. Ew xwe mîratgirên padîşahiyê dihesibînin û dixwazin wê ji nû ve vejînin. Ew hemû alîgirên Riza Pehlewî ne, ku xwe weke mîratgirê rastîn ê padîşahiyê li Îranê pênase dikin. Lê derket holê ku ew ne siyasetmedarekî jêhatî bû, ne jî xwedî têkoşînek siyasî ya girîng bû, û tenê tişta ku wî şanazî pê dikir ev bû ku dibêje ew cîgir û kurê mezin ê şayê berê bû. Şoreşa Jînayê naveroka kesatiyên siyasî yên paşaxwaz eşkere kir, ku yek ji wan qebareya şiyanên siyasî yên Riza Pehlewî bû. Hinek ji alîgirên paşatiyê jî hene ku vê tiştê weke lawaziya Riza Pehlewî di warê siyasî de dihesibînin. Lê paşaxwazan ti kesekî din tune ye, ji ber vê yekê divê li pey wî biçin.

Paşaxwaz, Komarî û partiyên netewî yên gelê Îranê wek dijminên xwe dibînin. Herçiqas li ser rûyê erdê basa dêmokrasiyê dikin, lê Şoreşa Jînayê rûyê wan derxistiye holê û cewher û naveroka wan ji her kesî re eşkere bûye ku ji bilî xwe tu kesî qebûl nakin.

Dema ku basa destûrê dikin, bi kiryarên xwe nîşan didin ku di vî warî de ne rast in û bi rastî jî hikûmeteke weke Riza Şah dixwazin. Ew li dijî mafên gelên pêkhateyên Îranê ne û di wê baweriyê de ne ku Îran yek netewe, yek al û yek ol e. Ew hemû neteweyan, bi taybetî jî Kurdan, weke cudaxwaz û dijminên yekparçeyiya welatê xwe dihesibînin. Loma jî şûrê xwe li hember neteweyan kişandine. Ji bîr kirine ku rêjîma niha û ya berê hin perçe ji Îranê veqetandine û gelên Îranê ew kar nekirine. Bi giştî li dijî Komarparêzan, Mucahidîn û çepgiran bi tundî dijkiryarên nîşan didin. Ji ber vê yekê ew ne tenê naxwazin bi wan re hevalbendiyê bikin, di heman demê de wan wekî "êrîşker yan dujminên" împaratoriya xwe dihesibînin. Hêz, şiyan û piştevaniya wan di nav Savakîyên berê û malbatên Şaperestan de ne ku piştî şoreşa gelên Îranê reviya ne derveyî welat. Heger em bêjin di hundirê welat de alîgirên wan nîn in, em ne rast dibêjin, ji ber rewşa baş a aborî û çend kanalên têlêvîzyonî û medyayî, kêm û zêde alîgir ji wan re bi dest xistine, lê dîsa jî hejmara wan bi lihemberdan ligel serhildêrên şoreşa Jînayê pir kêm e. Heger paşaxwaz bi rastî dêmokrat bûna û baweriya wan bi dêmokrasiyê hebûya, mafê wan bû ku wek partî û tevger bimeşiyana û helbet dê zêdetir bihatana qebûlkirin.

Di pêkhateya opozisyonê de, bi taybetî opozîsyona derve, her çendî mixabin bandoreke wan a kêm li ser bûyerên navxweyî heye, lê xwepêşandanên li derve di proseya şoreşa Jînayê de girîng bûn û weke faktereke erênî tê dîtin û nirxê wê dizanin. Ji aliyek din ve mixabin hinek opozisyonên derve bi taybetî paşaxwaz bûne sedema dualîtiyê. Wan ew yekrêziya ku di destpêka Şoreşa Jînayê de hate dîtin, jinav bir. Niha hevbendiyek di navbeta opozîsyona navxweyî û partiyên gelên bindest ên Îranê de tê hêvîkirin. Sendîkayên karkeran, civaka sivîl, xwendekar, tevgerên jinan, mamoste, hunermend û bi sedan çalakvan û rewşenbîrên ku niha di girtîgehên rêjîmê de bi tawanên bê guneh têne darezandin, şiyana yekrêziya bihêz hene. Mînaka vê hevpeymaniyê, manîfestoya daxwazên Îranê yên ji bo pêkhatina çîn û medenî ya serbixwe ye, ku pir dêmokratîk û berfireh e û divê piştgirî jê re bê kirin da ku bihêztir bibe. Xwediyên sereke yên Şoreşa Jînayê gelên bindest ên welat in.

Wek gotina dawiyê, merca serekî ya her yekgirtinekê ew e ku platforma yekgirtinê bi zelalî rêjîma piştî rûxandinê diyar bike, ne ku nêrîna şoreşê tenê hilweşîn e û bêje ewê piştî rûxandinê, rêjîma pêşerojê diyar bike. Ew heman şaştî ye ku di şoreşa 1957'an de hat kirin. Lewma divê ji niha ve sîstêma pêşerojê

# Desthilata reha



**N: Hesen Mukerem**

Li bajêrê Rafîdeyn ku Lîlîs an heman Şeytanê bahozê şopînerê Hewa bûye û wiha adet bûye ku nexweşî û mirinê tîne, bo yekem car karektera Lîlîs wek şeytan an heman ruh ku xuya dibe girêdayî ba û baran û bahozê bûye, di nav Someriyan de yanî 3000 salan berê Zayînê bi Lîlîto naskirî bûye û hinek vekolîn behsa vê yekê dikin, û bi sedema lerzîna dengê vê, û tiraşînan navê Lîlîs wedigerînin bo 700 salan berê Zayînê.

Di wêjeyê de pir girîngî ji Lîlîs re hatiye dan û dişibîn bi jinek şehvetbaz û dirinde û wêranker ku timaya gihîştin bi desthilata reha ya xwedavendan hebûye û mirovekî serkêş û îsyankar bûye.

Bo dubarekirina desthilata reha an heman desthilata serberedayî û wekheviya zilam û jinê de car caran winda bûye.

Dubare her vê di barê de di çîroka pirtûka Cîta ya Almanî de ku li sala 1565an a Zayînî hatiye nivîsîn, behsa keçikekê dike ku navê wê Cîta an ciwan ku temisîla jineke îsyankar dike.

Li sala 1667an Mîltonê bi zelalî îşare bi Lîlîsê kiriye û di pirtûka Bihişta Winda de, Lîlîs wek mareke sherker binav dike û bi pehlevanê romansî binav dike û dibêje Lîlîs jineke şehvetbaz û bedev û bejin bilind û porên wê dirêj bûye ku derdora xwe ber bi felaket û tarîtiyê ve biriye.

Vîktor Hogo jî, Lîlîs dişibîne bi jineke xwînmêj û her weha xwastiye bişibîne bi şeytan û girê bide bi şeytanê mezin, ji ber ku keçika şeytan wek xwedavendan binav dike da ku jêra bibêjin rûhaniyeta tarîtiya cîhanê.

Niha Rêveberên Komara Îslamî jî bi heman awayî li ser navê Îslamê û li rêya dezgehên wek Geşda Îrşad û … hwd bi hemû awayî bona gihîştin bi desthilata reha an heman serberedayî xwe li ti kiryareke nemirovene naparêz in û rewşa welat ber bi tarîtiyê ve dibin.

Her li dema hatina serkar a Komara bi nav Îslamiya Îranê, komkujî, îşkence û tunekirina mirovên azadîxwaz û felaketê li Îranê dest pê kiriye.

Bo mînak fermanên rêveberên Komara Îslamî yanî Xumeynî û Xamineyî yên wek darvekirin û girtin û dest dirêjîkirina bi ser girtiyan de yên di dehkên 60 de,li seranserê Îran û cîhanê deng vedaye.

An em gelek dûr neçin, di heyama destpêkirina Şoreşa Jînayê de, hêzên Komara Îslamî bona parastana desthilata xwe ya reha û biyom, bi sedan keç, jin, zarok û xortên azadîxwaz û bêzar ji vê desthilata dîktator û wêranker, girtin û darvekirin an jî li bilindahiyan avêtin xwarê.

Rêveberên Komara Îslamiya Îranê li ser navê Îslamê bi berdewamî jin û keç û zilamên welat bi hincetên cuda digrin û di girtîgehan de darvedikin an jî hepsên heta hetayî bi ser van didin sepandin.

Detshilatdarên Komara Îslamî tevî van kiryarên xwe yên dûr ji mirovahiyê, li ser ekranên medyayan û di civatên navneteweyî de, berdewam behsa wekhevî û mafê mirovî dikin. Lê di pişt perdê de kasayetiyek din in.

Bo mînak di yasa û biryarên xwe de berdewam behsa hicab û dûrî ji kiryarên bê exlaqî dikin heta çendîn caran bi hincetên binav berevanî ji kerameta Îslamî şerî, jin û keçên welat, kevir baran kirine, ku ev yeka di halekê de ye ku, di Cotmeha sala 2016an de kesayetiya veşartî ya Mihemed Gendumnijad ê naskirî bi Hecî Seîdê Tûsî ku di xwendina pirtûka Qura`anê de çendîn pileyên herî bilind bi dest xistine, her wisa Seîd Tûsî li Civata Bilind a Qura`anê û di bin çavdêriya beyta rêberî de û li deng û rengê Komara Îslamî ya Îranê de, wek pisporê berpirsê ciwanan di civata Qura`anê ya welêt de dixebitî.

Eşkere bû ku wî kesayetiyê olî û cihê baweriya Welî Feqîh, destdirêjiya sexsî kiriye ser nêzî 20 nûciwanên ku ber destê wî hînî xwendina Qura`anê dibûn.

Pêka yasayên Komara Îslamî encamderên sûçên wiha heram bi nûciwanan an her kesî re, cezayê van darvekirin e, lê, Seîd Tûdî xwendevanê navdar yê Qura`anê yê Welî Feqî, nehat ceza kirin û piroseya şopandina doseya wî bi temamî hat rawestandin.

Dubare di heyamên ne gelek dûr de yanî du hefteyan berî niha destdirêjiya sexsî ya Riza Seqetî berpirsê Giştî yê berê yê Îdareya Çand û Îrşad a bajarê Gîlanê û avakerê kargeha Hicab a Îfetê yê Komara Îslamî bi ser zilamek din de eşkere bû.

Dosyeya wî berpirsê rejîmê jî dê her wek ya Seîd Tûsî be, ji ber ku her li destpêka vê desthilata biyom de ev kiryarên nemirovane yên berpirsên Komara Îslamî ku dişibin bi kiryarên şeytan an heman Lîlîs, rewa bûne.

Heps û darvekirin bo kesên girêdayî bi rejîmê an şeytanên rejîma biyom ku desthilata reha hene, nerewa ye, lê bo jinek an keçik ku tenê xavikê li ser porên xwe vêde bibe, rewa ye.

Birîna cezayên giran, kuştin û îşkencekirin û heta di vê dawiyê de dozgeriyên Komara Îslamî bona bêhurmetîkirin û şikandina kerameta jinan, ragihandin ku her keç an jinek li ser şeqaman an cihên giştî de porên wê diyar bibin dê bigirin û cezayê şûştina miriyan bi ser van bisepînin.

Ya ku heta niha di vê nivîsê de hatiye behskirin ne serpêhatî an çîrok an efsane ne, belkî hemû heqîqetên derbara kesayetiya şeytan û xwînmêjên serdemê, yanî desthilatdarên dirinde yên Komara Îslamî ne, yanî dema ku mirov kiryarên desthilatdarên vê hikûmetê di gel Lîlîs de dide ber hev, mirov wisa hizr dike qey van ber destê Lîlîsê şeytan perwerdehî dîtin e, çimkî ev jî bona gihîştin bi desthilata reha û xwe sepandin bi ser xelkê de xwe ji encam dana ti kiryareke dirindane û afirandina felaketê li hundirî welat û herêmê de naparêzin û wek tişteke biyom in li her kiderê bin bêguman, cinayet destdirêjî, nedadperwerî û komkujî û hezaran tawanên din yên dûr ji mirovahiyê hene.

## Daristanên Merîwanê di nav agir de dişewitin



Midehek e her carê aliyeke daristanên Merîwanê ji aliyê neyarên jîngeha Kurdistanê ve têne agirberdan û çend roj e daristanên derdorên bajarê Merîwanê di nav agir de dişewitin û tenê jîngehparêz û xelkê jîngehdost hewla temirandina agir didin. Wan daxwaz ji xelkê bajarên derdor kirine ku bo temirandina agir alîkariyê bidine wan.

Neyarên jîngeha Kurdistanê roja 11ê Gelawêjê agir berdane daristanên gundê “Asinewe” yê Merîwanê û roja Pêncşemî 12ê Gelawêjê jî, agir berdane daristanên gundên “Gumareleng û Dereweran” ên Merîwanê.

Berfirehiyek zêde ji daristanên wan gundan di nav agir de şewitîn û agirê wan deveran niha jî berdewam e; Agirê wan daristanan ji aliyê hin encumenên jîngehparêzî û xelkê jîngehdost ve tê temirandin.

Encumena Kesk a Çiyaya Merîwanê di daxuyaniyeke bilez de daye zanîn: “Bi sedema berfirehbûna agirê daristanên Gumareleng, Dereweran û Kolît”ê, endamên beşdar ji bo temirandina agir, pêwîstiya wan bi hevkariya bilez e, ew bi hemû hewla xwe ve agir ditemirînin, lê eger xelkê Merîwanê û navçeyên derdor bi hawara wan ve neyên, egera her cure bûyereke nexwastî tê pêşbînîkirin”.

Di beşeke din a daxuyaniya Encumena Kesk de hatiye: “Hevwelatiyên hêja, wek tê zanîn Merîwan çend roj e di nava agirê cehenemî de ye û derdora gundên Dereweran, Neçê, Hencîran, Mirane û Kollîtê di nav agir de dişewitin, endamên Encumena Kesk û kesên xwebexş 48 demjimêrên in ne razan e û ne tiştek xwarine û wan hewcehî bi hevkariya hemû aliyekê heye”.

Heta vê gavê çendîn encumenên jîngehparêzî yên Kurdistanê û xelkê medenî ji bajarên din ên Kurdistanê ji bo temirandina agirê neyarên jîngeha Kurdistanê li Merîwanê amade bûne. Du endamên Encumena Kesk a Çiyaya Merîwanê di dema temirandina agir de hatine birîndarkirin.

# Diyalog bi marjînal



N: Kerîm Perwîzî
W: Hesen Mukerem

Gelek rê hene ku hûn dikarin tiştek bibînin an jî biryar bidin ku hûn nebînin!

Dibe ku dîtina tiştan ji nedîtina wan pir hêsantir be, lê carinan berjewendîyên kes û koman nayên dîtin!

Li Îraneke ku girêdayî dîktatoriya rejîma înkarê ye, bi salan e ku komên cuda ji bo derbaskirina vê sîstemê yan jî bi kêmanî kom û kesên din ên xwedî taybetmendiyên cuda bixebitin, têdikoşin, lê ev hemû hewldan heta niha bi ser neketiye.

Têkoşîna jinavbirina vê rejîmê nayê wê wateyê ku tiştek nehatiye kirin û tiştek bi dest neketiye, berevajî vê yekê, di heyama çar salên borî de gelek valahî di rejîmê de derketine û sîstema rejîmê bi tevahî hatiye jinavbirin û êdî nemaye. Bersivek ji bo Besîciyan. Dema ku her roj li quncikekî welat fîlmên gendeliya exlaqî tên weşandin, Besîciyên herî tundrew jî matmayî dimînin û dizanin ku îdeolojiya wan gemar û pîs e.

Pirsa mezin ew e ku çima ev rejîma gemar nehatiye rûxandin û li şûna wê rejîmeke din nehatiye danîn?

Dibe ku sedema bêencambûna têkoşînê li ser asta tevahiya Îranê yekalî nebe û çend faktorên sereke bandorê li wan bikin, lê faktora herî girîng jî nenaskirina rast a pirsgirêkên sereke yên erdnîgariya Îranê ye.

Dema rejîmek siyasî li ser desthilatê be, dibe ku dijberê wê ji aliyê siyasî û îdeolojîk ve bi tevahî berevajî wê bifikire, lê dibe ku di bin bandora pîvan û hegemonyaya rejîmê de hin gotinên sereke dubare bike û nikare rastiyê bibîne!

Eger em gelek dûr neçin, di heyama çend rojên derbasbûyî de, komîteyek bi navê Komîteya Şopandina Mafê Jiyanê peymannameyek belavkir ku di nihêrîna pêşîn de pir xweş xuya dike ku divê komên siyasî yên cuda li ser vê peymanê tevbigerin ku niha û di pêşerojê de mafê jiyana mirovan û kesan binpê nekin. Lê hin hûrgulî li peymana bi navê peymanê hin siklên pirsgirêkên sereke yên li Îranê nîşanî me dide:

Yekem: Di daxuyaniya komîteya şopandinê de tê gotin ku komên îmze kirine di hin hevokan de cudahî hene û em çawa xwe li ber “pirsgirêka navend-margin” nadin, ev metnên cuda wek xwe tînin!

Her di destpêka vê hevokê de pirs derdikeve holê û baweriya bi mafên pênasekirî tê pirsîn!

Çima komîte ji pirsgirêkê dûr dikeve? Ma her çalakvanekî mafên mirovan divê baweriyeke azad bi mafên mirovan hebe û şîretan ji nedîtî ve were û eger pirsgirêkek hebe bila bibe aliyê rastiyê? Çima piştgirê rastiyê nabin û xwe dûr naxin?

Di vê hevokê de pirsa din û sereke ew e ku çima pirsgirêkê wekî navend-margîn pênase dikin? Ma kê maf daye wan ku aliyek wekî navend û yê din jî wekî derdor îlan bikin? Ma ne çêtir e ku mirov kêşeya di navbera mafxwazan û piştgirên binpêkeran de bibêje!?

Ya duyemîn: Peymannameya Cîhanî ya Mafên Mirovan heye, ku bi dehan salan ji aliyê hemû cîhanê ve li ser tê xebitandin.

Çima nabêjin bila hemû kom pabendî van daxuyaniyan bin û hemû daxuyaniyên wan ên cîhanî qebûl bikin?! Çima ew peymanek kurtkirî tînin ku mafên herî girîng ên neteweyan û mafên kesan ji holê radike?

Sêyem: Di nav wan kesên ku îmze kirine de, girûp hene ku di warê mafên mirovan û mafên netewên bindest ên Îranê de tu cudahiya wan ji rejîma desthilatdar nine û her heman edebiyata rejîma niha liçav neteweyên zilmlêkirî an li gorî gotina komîteyêna şopandinê ya van marjîn .


میثاق حق زندگی
فراخوان برای اعلام میثاق با هدف دفاع از «حق زندگی»

۱۵ تشکل سیاسی، حزب و ائتلاف دموکراسی‌خواه (شامل ۳۲ گروه اپوزیسیون) متن «میثاق حق زندگی» را همزمان به صورت جداگانه و انفرادی منتشر کردند و خود را به آن متعهد دانستند.

گفتنی است متن منتشرشده از سوی تعدادی از این گروه‌ها، دارای تفاوت‌های جزئی است که برآمده از تفاوت نگاه این گروه‌ها نسبت به مساله‌ی هویت مرکز-پیرامون است. همچنین در متن برخی از گروه‌ها از واژگان متفاوتی برای نامیدن حکومت فعلی و آینده‌ی ایران استفاده شده است. از آنجا که رسالت این میثاق حل مناقشه‌ی هویتی مرکز-پیرامون نیست، همچنین ادبیات و صورت‌بندی کلامی تغییر جمهوری اسلامی، در اصل محتوای میثاق تغییر زیادی ایجاد نمی‌کند، کمیته کارزار «میثاق حق زندگی» خود را ملزم به انعکاس اخبار مربوطه می‌داند و از متعهدان به هر سه متن مشابه قدردانی به عمل می‌آورد.

اسامی ۱۴ ائتلاف، حزب و تشکل سیاسی به این شرح است:

۱- اتحاد جمهوری‌خواهان ایران
۲- جبهه مردمان ایران
۳- جبهه ملی ایران ـ اروپا
۴- حزب چپ ایران
۵- حزب دمکرات آذربایجان
۶- حزب دمکراتیک مردم ایران
۷- حزب مشروطه ایران (لیبرال دمکرات)**
۸- سازمان فدائیان خلق ایران (اکثریت)
۹- سازمان‌های جبهه ملی ایران در خارج از کشور
۱۰- شورای مدیریت گذار
۱۱- شورای ملی تصمیم
۱۲- کنگره ملیت‌های ایران فدرال*
۱۳- نقشه راه برای دموکراسی در ایران
۱۴- همبستگی جمهوری‌خواهان ایران
۱۵- همبستگی فراگیر برای آزادی و برابری در ایران*

*تغییرات در متن منتشر شده از سوی این گروه ها به این شرح است:
۱- تغییر عبارت "تعلق اتنیکی" به "تعلق فرهنگی، زبانی و ملیتی"
۲- تغییر عبارت « دوره‌ی مبارزه با حکومت حق‌کش ولایی، در جریان گذار و در دوره‌ی پس از آن» به عبارت « دوره‌ی مبارزه برای تغییر کلیت (سرنگونی) حکومت "جمهوری اسلامی" و پس از آن تشکیل نظام سیاسی دمکراتیک جایگزین»
**تغییر در متن منتشر شده از سوی حزب مشروطه ایران به این شرح است:
تغییر عبارت "تعلق اتنیکی" به "تعلق به خانواده اقوام ایرانی"

Ew di wê baweriyê de ye ku li Îranê neteweyên cuda nînin û ya ku heye hinek eşîr in! Ev kom heta van çend xalên mafan jî qebûl nakin û bi destkarî belav kiriye!

Di demekê de ku rejîma înkarê di Îranê de bûye sedema wêraniyê û bi hinceta dabînkirina yekparçeyiya xak û ewlehiyê, netewên bindest kuştine û tawanên dijî mirovatiyê li dijî wan pêk tîne! zilma siyasî ya li dijî neteweya Fars jî perdepoş û rewa kiriye, komên bi navên dijber hene ku neteweyên di bin heman hegemonyaya Komara Îslamî de bi cudaxwaziyê tawanbar dikin! Li dijî mafên wan ên bingehîn e!

Îmzekirina peymanan bi komên wiha re ne mimkûn e, ji ber ku peyman û hevkarî hewcedarê diyalogê ye û diyalog ne di valahiyê de dest pê dike, lê bi fermî naskirina nasname û mafên kesên din dest pê dike.

Komeke ku we bi fermî nas neke, nasnameya we ya netewî berovajî bike û we wek eşîrekê bibîne, eşkere ye ku bi we re diyalogê neke, lê di her hevdîtinê de dê hewl bide we şîretan bike ku hûn nebin bindestê dijminên xeyalî û li ser rêya rast tevbigerin!

Bi gotineke din, xwe wek mexlûqekî bê nasname û ne farisî jî bide nasîn da ku hûn mafên tam jê we re bên dayîn, li şûna wê divê hûn ji qonaxek berê dest pê bikin û hewl bidin ku zimanê neteweya desthilatdar fêr bibin da ku hûn wekî mirov werin pejirandin!

Tiştê ku bi kurtî hat behskirin, nihêrînek bilez bû bi hinceta vê kurte peyamê, da ku bi bîr bîne ku mijara sereke li Îranê ew e ku bi fermî nasnameya hev nas bikin û piştre li ser maseya gotûbêjan rûnên û behsa paşerojeke hevbeş û sîstema mafên wekhev bikin û hevkarî bikin.

Diyalog bi hewldana ji nedîtina tiştên ku hene û bi cûda pênasekirina rastiyan û dûv re li ser bingeha pênaseyên çêkirî sêwirana pergalên din pêk nayê. Ev sed sal in ku bi vî rengî tevdigerin û Îran anîne cihê ku lê ye! Hewce ye ku ew corek din bibînin!

## Nerîna Lîderan



**"Mihemed Nazîf Qaderî,:"**

"Îranê her tim gef li partiyên Kurd xwariye, lê em dest ji têkoşîna xwe bernadin.



**"Xalid Ezîzî":**

Em naxwazin Herêma Kurdistanê bikin qada şer û pişt cibihey xwe li hember rejîma Îranê



**" Nêcîrvan Barzanî :"**

Eger berê tenê hikûmeta Iraqê bû, naha Îranê û heta Tirkiyê jî lê zêde bûne.



**"Mihemed Shia‘ al-Sudani"**

Iraq ber bi vebûnê ve diçe

# Binçavkirin, sepandina ceza û bidarvekirina li ser çalakvanên torên civakî ji aliyê Spaha Pasdaran û îdareya Parastina Zaniyariyan a rejîma Îranê



## N: Homen Simko



Înternet û torên civakî di Îranê de xala lawaz a rejîma dîktator û qatilê neteweyên li Îranê tê hesibandin.

Parastina Îtilaat Spaha Pasdaran a rejîma Îranê, her cure çalakî û belavkirina her bûyer û nûçeyekê li ser rewşa niha ya Îranê serkut dike.

Bi naskirina kesên ku bi nûçeyên bi vî rengî re mijûl dibin, di nav de vîdyo, nivîs, wêne û her cure malperek, bi awayê herî bilez û tund reftarê digel dikin. Tirsa vê rejîma dagîrker neteweyên li Îranê bi qasekî ye ku bi salan e li dijminatêkirin digel neteweyên li Îranê û bi taybetî neteweya Kurd xwe ji encamdana ti kiryarekê neparastiye .

Di tevgera vê dawiyê ya "Jin Jiyan Azadî"yê de, li gor gelek raportên sazî û dezgehên mafên mirovan ji malperên cihê bawerê li seranserê Îranê û cîhanê, ew perde li ser kuştiyên bidarvekirinên lipeyhev ên vê rejîmê radike. Gelek ji welat û rêxistinan kirayara gemara rejîmê bi kuştina ciwan û gelên Îranê li kolanan û bi girtina kesên ku di vê şoreşê de beşdar bûne, dest bi vê tevgera rezîl a rejîmê kirine. Îro bi deh hezaran Îranî di zindanan de ne û bi hezaran jî hatine îdamkirin.

Bi darvekirina ciwanan li ber çavan hewl dide gelê Îranê ji derketina derve û tevlîbûna bi vê tevgerê bitirsîne. Lê gelên li Îranê bi taybetî gelê Kurd, bi mêrxasî û bi hişmendiyeke bilind a netewî, ji bo welatekî azad mil bi mil hev li meydana şer digel rejîma kevneperest Îslamiya Îranê têkoşînê dikin û vê yekê bi bê çaverêtî ji ti dewlet a hêzekê, di vî warî de alîkariya rêberatiya xwe dikin.

Daxwaza gelên Îranê ji bo herifandina rejîma Îslamiya Îranê, ku di warê siyasî, çanda siyasî xaleke reş li ser rûyê dîroka Îranê ye, cihê şermezariyê. Rûmetek ku gelê Îranê aciz kiriye û ti nirxek mirovî ji bo ti kesekî Îranî li cîhanê de nehiştiye. Rejîma Îranê pê hesiyaye ku her rejîm û împaratorî rojekê destpê dike û dê rojekê ji nav here. Bê guman dê ev rejîm bê herifandin û berpirsên wê ji aliyê gelê Îranê ve bi tundtirîş şêwazê dê bêne cezakirin.

Îro yasadanerên rejîma paremayî ya Komara Îslamî yasayên nû tomar dikin ku bi awayekî kar û kiryara xwe bisepînin û desthilata xwe qahîm bikin û bi pêka wan yasayên xwe raportan dinivîsin ku em li gor yasayên Îslamî û destûrê bi dijberên wan re reftar dikin.

Roj nîne ku rojnamevan, aktîvîstên sivîl, civakî û siyasî, parêzvanên mafên mirovan û azadîxwazên Tevgera "Jin Jiyan Azadî"yê neyên bidarvekirin, îşkencekirin û girtin. Rejîma Îranê piştî çil û sal û çend salan roj bi roj nêzîkê herifîn û jinavçûnê dibe. Bi van kiryarên vê dawiyê, bi bidarvekirin û îşkencekirina ciwanan di girtîgehên Îranê de, mohra herifîna xwe li ser pela wêrankirin û hilweşandinê xistiye. Êdî bes e, edî we t çareyek bilî teslîmbûn bi tevger û yekitiya neteweya Îranê nîne.

Hewce ye ku bê gotinê, ku di wan kiryarên vê dawiyê yên rejîmê de, herî zêde Kurd zirar dîtine û ev kiryarên nebaş a rejîmê li navçeyên Kurdistanê de bi awayekî eşkere tê dîtin.

Ji xalên bihêza a vê tevgerê mirov dikare îşare bike ku neteweyên li Îranê mezintirîn hevpeymanî li dijî rejîma Îslamî bi dest xistiye.

Çanda siyasî ya neteweyan li Îranê ketiye qonaxeke nû û baweriya wan bi yekîtiya xwe heye.

Rejîma Îranê li ser wê yekê ku hîcab parçeyek û binkeya Îslamê ye û xelkê ku derdikevin derve ji bo hîcabê derdikevin ne ji bo rewşa îroyîn, hewl dide raya giştî bixapîne.

Dixwazin bi peyamên ku bi xwe jî bawer nakin, raya giştî bixapînin. Eva li halekê ye ku neteweyên li Îranê ji her kiryareke rejîmê agehdar e û hertim, pêngavekê li pêş rejîmê deye. Êdî guh ji bo derewên rejîmê re vekirî nînin.

Daxwaza gelên Îranê û bi taybetî netewa Kurd, azadiya neteweyan li Îranê û neteweya Kurd e, wekhevî, edaleta civakî, veqetandina ol ji siyasetê, qada siyasî ya vekirî, xweşbijîviya civakî, siyasî, çandî û aborî ye Rejîma dîktator cihê manê nîne û hewceye ku teslîmî îradeya qayîm û bihêz a neteweyan li Îranê bibe.

Daxwaza şoreş û tevgera dawiyê eva ye: "yan mirin yan azadî" ev yeka dirûşma neteweyî ya Jin Jiyan Azadî"yê ye.



# Bûyerên diniyayê û bêtifaqiya Tevgera Siyasî ya Kurdî!



N:Ebdûlazîz Qasim

Wekî em dibînin ku roj bi roj şerê Rûsya û dewletên rojavayî yên (NATO) li ser aniya Ukraniyê gerimtir dibe, û niha ev şer tevlî kartêkirina wê ya rasterast li ser rewşa Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê, hêdî hêdî ber bi hin dewletên Afrîka û Rojhilata Navîn diçe, zêdebarî hevrikiya aborî li ser bazarên cîhanî û bi taybetî li ser teknolojiya û neft û genim di navbera Amerîka Rûsya û Çînê de, ku heta niha hîç asoyek nîne bo sarkirina vê rewşê.

Di vî şerê de, hinek dewlet wekî dewletên Ewropî zerermend in, bi taybetî dewletên hevçeperên Ukrayna, û hinek dewletên din, wekî dewletên Erebî, bi taybetî Erebstana Siûdiyê, Misr, Îmrat û Oman bi hişdariyek mezin xwe ji agirê şer dûr dikin, û wekî dewletên bêalî xwe didin nasîn, û dûr nîne ji aliyê Erebistana Siûdiyê "Înîsiyatîfek" ji bo rawestandina şerê Rûsya li ser Ukrayna bête pêşkêşkirin, lê li aliyek din hindek dewlet jî sûdmend hene, wekî Tirkiya û Îranê, ku dorpêça dewletên Ewropayê li ser Rûsyayê, pêgeha Tirkiyê li rex herdû aliyên hevrik (Rûsya û NATO) zêde dike, herwiha bi heman şêweyî û zêdetir ev şer dibe fakterekî bihêz bo zêdekirina pêgeha Îranê bi taybetî ku şerê Rûsya- Ukrayna dikeve di berjewendiya Îranê de, ji ber çend sedeman, ku yekem guvaşên li ser rêjîma Îranê yên ji aliyê Amerîka û NATO ve heta radeyekê mezin kêm dike, herwisa pêgeha Îranê li rex Moskow jî bihêz dike, tevlî hevrikiya di navbera Îranê û Rûsya de li ser neft û gazê, lê tê pêşbîkirin ku têkiliyên bazirganî û leşkerî di navbera wan de zêdetir bibin, lewra niha Amerîka hewl dide rê bigre li hejmongeriya Îranê, ji ber vê yekê em dibînin ku Amerîka li vê dawiyê bi awayekî cidî kar dike ji bo asyîkirina têkiliyan di navbera Îsraîl û Siûdiyê de û her wisa li aliyê leşkerî ve kar dike ji bo bihêzkirina bingeh û hêzên xwe yên deryayî li navçeyê, ji bo her rûbirûbûneke egerî bi Îranê re li ser qerax û peravên Okyanûsa Hindî û Kendavê, û herwiha rûbirûbûna milîsên wê yên wekalet li ser qeraxên deryayê li rojhilatê Derya Sip û Derya Sor, zêdebarî bihêzkirina pêgeha xwe ya leşkerî û siyasî li Rojavayê Kurdistanê û Rojhilata Firatê li Sûriyê.

Belê; wekî xuya dike ku Îran û Tirkiyê wek dû dewletên dagîrkerên Kurdistanê û herwiha kartêker di nav xaka Sûriyê de, heta îro sûdmend in ji vê rewşa niha ya li cîhanê, lê herdem wisa diyar dibe ku rewş û hevsengiyên siyasî wisa berdewam nakin, û tê pêşbînîkirin ku ev herdû dewlet di demek nêzîk de rastî ziyanên mezin bibin, bi taybetî rêjîma Îranê ya dagîrker û kurdkuj, lê bi mixabînî dikarin bêjin ku heta niha Tevgera Siyasî ya Kurdî nikariye bibe xwidan roleke kartêker di nav van kêşe û hevrikiyan de, belî pitir ji ber bêtifaqiya Tevgera Siyasî ya Kurdî ne li ser astê navxweyî yê her parçeyekî Kurdistanê û ne jî li ser astê neteweyî jî, û sedemê dîtir divegire ji ber ku Siyaseta Kurdî maye dîl û îxsîrê siyaset û têkiliyên herêmî ku bi hesanî ji aliyê dewletên dagîrkerên kurdistanê tê xenqandin û fetisandin.

Lewra îro, yekrêziya Tevgera Siyasî ya Kurdî girîngiyek neteweyî û navdewletî heye, bi taybetî li Rojavayê Kurdistanê, ku tevlî gendelî, parçebûn û têkşikestina partiyên kurdî, lê di vê qonaxê de dibe tifaqa van partiyan û aliyên siyasî li Rojavayê kurdistanê bibe fakterek bo tifeqa Gelê kurd û herwiha tifeqa Revenda kurdî li derveyê Welat, û li dawiyê bibe fakter bo bihêzkirina rola Gelê Kurd di nexşê paşeroja Sûriyê de û li ser maseyên danûstandinê yên herêmî û navdewletî jî.

Zêdebarî vê yekê ku îro hejmareke mezin ya Kurdên Rojavayê Kurdistanê li Ewropa û Amerîka heye, wekî dibînin ku Kurdên Rojavayê Kurdistanê dikarin bi çalakiyên mezin rabin, û helbet her tifeqek kurdî-kurdî li Rojavayê Kurdistanê dê bibe hokar û hander bo çalakkirin û aktîvkirina tevaya Revenda Kurdî li Ewropa û Amerîka û herwiha bo piştevaniya doza netewyî ya Gelê Kurdî li seranserî Kurdistanê.

# DAIŞê kuştina serkirdeyê rêxistinê ragihand



DAIŞê kuştina çarem serkirdeyê rêxistinê li Sûriyê ragihand û kesekî din li şûna wî danî.

DAIŞê kuştina çarem serkirdeyê rêxistinê li Sûriyê ragihand û kesekî din li şûna wî danî.

Li gor nameyeke dengî ya Berdevkê DAIŞê Ebû Huzeyfe El Ensarî, çarem rêberê DAIŞê Ebû Huseyn El Huseynî El Qureşî di rûbirûbûna hêzên Desteya Tehrîr El Şamê (Bereya Nusreya berê) li bakurê rojhilatê Sûriyê hat kuştin.

Berdevkê DAIŞê eşkere kiriye, ji ber rûbirûbûna rasterast, Ebû Huseyn El Huseynî El Qureşî piştî birîndarbûnê, hatiye kuştin. Lê dem û cihê kuştinê eşkere nekiriye.

Her wiha ragihandiye ku li şûna Ebû Huseyn El Huseynî El Qureşî, Ebû Hefs El Haşimî El Qureşî wek rêberê nû yê DAIŞê hatiye diyarkirin.
Di sala 2019an de Ebûbekir Bexdadî wek yekem serkirdeyê DAIŞê ji aliyê Amerîkayê ve hat kuştin, her wiha di sala 2022an de Ebû Îbrahîm El Qureşî wek duyem serkirdeyê DAIŞê li Idlibê jat kuştin, di heman salê de Ebû Hesen El Haşimî El Qureşî di rûbirûbûna ligel hejmarek çekdarên navxweyî yên li başûrê Sûriyê de wek sêyem serkirdeyê DAIŞê, hat kuştin.

# SOHR: 2 şervanên HSDyê canê xwe ji dest da

SOHRê ragihand ku li Reqayê 2 şervanên HSDyê canê xwe ji dest daye, şervanek jî birîndar bûye.

Rewangeha Sûriyeyê ya Mafên Mirovan (SOHR), da zanîn ku li parêzgeha Reqayê ya Sûriyeyê 2 şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) canê xwe ji dest daye, şervanek jî birîndar bûye.

SOHRê ragihand ku endamên DAIŞê li Reqayê li kêleka rê mayîn çandiye û dema ku wesayîta HSDyê derbas bûye mayîn bi wesayîtê de teqiyaye.

Hat ragihandin ku HSDyê piştî bûyerê li herêma teqînê dest bi lêkolîneke berfireh kiriye.

Li aliyê din HSDyê li ser bûyerê hîn ti daxuyanî nedane.

SOHRê ji destpêka 2023an heta niha li herêmên di kontrola Rêveberiya Xweser de 103 êrişên DAIŞê tomar kirine.

68 kesan canê xwe ji dest daye

SOHRê ragihand ku di van êrişên DAIŞê de 68 kesan canê xwe ji dest daye û hejmara kesên ku canê xwe ji dest daye bi vî awayî ye:

-51 şervanên HSD û Asayîşa Rojavayê Kurdistanê

-12 sivîl

-4 DAIŞî

-Kesekî ku nasnameya wî nehatiye eşkerekirin

Li gorî rapora SOHRê, DAIŞê li Dêrezorê 77 caran, li Reqayê 13 caran, li Helebê 3 caran û Hesekê jî 10 caran êriş kiriye.

HSDyê sala 2017an Reqa ji destê DAIŞê rizgar kiribû lê li Reqayê êriş û tevgerên DAIŞê hîn jî didomin.

# Hizrkirina azad û azadiya ramanê



N: Vênûs Fayq
W: Hesen Mukerem

Yek ji wan têgehên ku hê jî li ser pênaseyê lihevkirinek çênebûye, azadiya ramanê ye ku li gorî dîrok û erdnîgariyê diguhere, ku pirsgirêka di navbera azadiya gotinê de ye ku jê re dibêjin û pêwendî bi azadiya ramanê ye, wiha mafê azadiya gotinê hatibe zeftkirin, hizrkirina me jî hatiye zeftkirin.

Pêka vê yekê raman beriya îfadeyê tê. Ew desthilatdarên ku mafê gotinê ji mirovan distînin, li ser ramana mirovan dixebitin ku bi şêweyek tenê ji bo xwe bifikirin û van tiştan bibêjin ku di berjewendiyên desthilatdaran de ne.

Ne ew e ku di civaka me de gelek astengî li pêşiya azadiya gotinê hene, û qanûnê jî di navbera partî û olê de xwe di gel vê piroseyê de yekalî nekiriye. Belê, pirsgirêka herî mezin têgihîştina têgehê ye, ji ber ku yên ku qanûn bi xwe dinivîsin, dibe ku ne xwediyê têgihiştinek kûr û li hemû aliyan ji hemû rehendên azadiya gotinê bin.

Heta ol jî ku tu qadeke kêrhatî bo wê azadîyê tune ye, problema herî mezin pê re heye, ji ber ku bi pêdaçûna hemû tekstên Quranê yek nivîsek ku îşare bi her cure azadîyê bike nayê dîtin.

Tu ku di gel xwe û li hundirî hişê xwe nekarî bi azadî hizr bikî û her dem tiştek hebe ku tu jê bitirsî an jî tiştek hebe ku heke tu bibêjî ewê berjewendîyên te bixe metirsiyê, êdî ewa tuyî ku yekem care ji wî mafê azadiya gotinê ji xwe bêpar dikî.

Azadiya ramanê di bingeh de bi perwerdehiyê ve girêdayî ye. Perwerdeya civakî, hizbî, siyasî û perwerdeya bi wateya giştî ya ku em ji malbat û dibistanê distînin, heta perwerdehiya hizbî û siyasî. Em ku mejiyê me ji zarokatiya xwe ve ji aliyê civak, ol, partî û siyasetê ve hatiye barkirin û dagîrkirin, ti wateyek bo axavtinê bo me nîne ku em behsa azadiya ramanê



bikin.

Yaku em pare mane û welatên din bi pêşketî pênase dike, ev yeka ye ku di welatên pêşketî de li rêya dana hemû azadiya ne, bi taybet mirov hîn dikin ku nerîna van hebe û biryarder bin, her dema ku di civakê de wisa perwerdehî tê dîtin, vê demê pirojeyek heye bo wergirtina desthilatê li welat de, bo îhsaskirin bi berpirsayetiya li hember bi civakê de.

Lê, li welatên pêşketî, tak ji pileya Megal zêdetir dernakevin û ya ku wan ber bi jorê ve dibe azadiya gotinê ye. Dema ku partiyek an serokek ji mirovan hêvî dike ku her dem çavnhêrî xelkê dike ku çepikan bo lêxin û pesnê wî bidin û di hemû deman de piraniya dengan ku bi her nirxekê be bê encam dan, vê demê vê yekê bizanibe ku azadiya gotinê di kirîzê de ye. Ji ber ku bi hemû pîvanan îfadeya azad weke îxanet tê pênasekirin.

John Stewart Mill got, “Eger her kes xwedî heman ramanê be, û tenê kesek xwedî ramanek cûda be, bêdengkirina wî kesî ji bêdengkirina her kesî ne cûda ye heke hêza wî hebe.

Di civaka me de azadiya ramanê ji dagîrkirina ji aliyê dewletek cîran ve metirsîdartir e, ev tê wê maneyê ku tepeserkirina azadiya ramanê pêşî li parastina ewlekariya netewî digire ku ji aliyê welatên cîran ve gef jê tê xwarin.
Em heya li hişê miroveki Ewrupî de jî, wek serhişk û dengê kipkirî tên pênasekirin, ku ev yeka jî di têkiliya me ya bi cîhana derve re pirsgirêk çêkiriye.
Ji ber ku mirov di civaka me de ji zarokatiya xwe ve bi rengekî ramanê ve mijûl e ku her axavtinek ji her cure azadiyê bi serê xwe sûc e.

Axir, azadiya ramanê ji ol, partî yan jî fikreke din a ku dikare were tunekirin, pir însanîtir e.

Ji ber ku aliyê din ê azadiya gotinê civakek hişmend e û welatiyek berpirsiyar e ji hemû pirs û prensîbên ku pê bawer in.

# Li Rûsyayê xwendekarekî Kurd di nav çem de xeniqî



Xwendekarekî Kurd ku ji bo xwendinê berê xwe dabû Rûsyayê, di dema avjeniyê de xeniqî.

Wezareta Karûbarên Bûyerên Nişkevayî ya Rûsyayê diyar kir, êvara 4ê Tebaxa2023an, peyamek gihiştiye beşa hawarçûnê ya wezaretê derbarê bûyerekê de li çemê Volkhov, li gor daxuyaniya Wezareta Rewşa Awarte ya Herêmê, termê xwendekar hatiye dîtin.

Li gor şahidên bûyerê, li dûrî 300 metre ji qeraxa bajêr, xwendekar di dema avjeniyê de xwe noqî avê kiriye û bi ser avê neketiye.

Herwiha hat destnîşankirin, piştre tîma rizgarkirina ji avê ya navçeyê û tîma lêgerînê û tîmeke hawarçûnê ya profesyonel şandine cihê bûyerê, di saet 17:20 xulekan de meytê ciwanê Kurd hatiye dîtin.

Hat zanîn, ciwanê di avê de xeniqî xwendekarekî Kurd e, navê wî Elî Îmanî ye û xelkê Rojhilatê Kurdistanê û 18 salî ye.

Bi mebesta xwendinê berê xwe daye Rûsyayê.

# Çiyagera jin a Kurd hilkişiya ser çiyayê herî bilind ê Qazaqistanê

Çiyagereke jin a Kurda ji Rojhilatê Kurdistanê hilkişiya ser çiyayê Xantangirî yê Qezaqistanê ku 7010 metr bilind e.

“Rûnak Zemanî” ya temen 35 salî û xelka bajarê Sineya Rojhilatê Kurdistanê weke yekemîn çiyagera jin a Kurd, karî hilkişe ser lûtkeya bilindtirîn çiyayê welatê Qazaqistanê yê bi navê “Xantangirî” ku bilindiya vî çiyayî 7010 metr e.

Navbirî di dema serkevtin bi ser çiyayê Qezaqistanê de alaya Kurdistanê jî bilind kiribû.

“Rûnak Zemanî” wek jineke Kurd berê jî, şiyabû hilkişe ser lûtkeya piraniya çiyayên Kurdistan û Îranê.



Hêjayê gotinê ye ku “Rûnak Zemanî” dixwaze xwe bo serkevtin bi ser lûtkeya çiyayê “Gaşir Biroma Du” ê di navbera welatê Çîn û Pakistanê de ku bilindahiya wê 8035 metr e, amade bike.

# Mafê jiyanê bi tinê têrê nake



N: Elî Munezemî

Çend roj berîya niha hewpeymanetiyek li aliyê 15 partî û hewpeymaniyan li peyvendî di şoreşa «Jin, Jîyan, Azadî» di bin navê «peymana jiyanê» hate weşandin ku ewê yekê jî li cem çavdêr û çalakvanê kurd nîgeranîyek mezin çêkiriye. Sedema wê nîgeraniyê jî dizivire ser hindê ku li wê peymanê de tu amajeyek bi mafê neteweyî û peywendîya navbera senter-derdorê nehatiye kirin. Li rastî de pejirandina mafê jîyanê tenê yêkek li 3 elementên dirûşma şoreşa «Jîna» li xwe digre ku ew jî tenê girêdayî bi mafê xwezayî û sirûştî yê hemû merivan re ye ku her merivekê tenê bi sedema merivbûnê xwediyê mafê jiyanê dihesibîne ku mafeke esasî û nayê înkarkirin e.

Mafê jîyanê bêy mafê çarenûsê ku pareke mezin a azadîyê e, nikare kartêkerîyek mezin hebe li ser çêyî a jîyanê. Jîyan bi keramet û azadîyê dikare wateya xwe werbigre. Mafê çarenûsê bo her kesê tê wateya azadîya hilbijartinên girîng ji bo jiyan û tenduristiya xwe.

Eger kesek xwediyê wê azadiyê nebe, nasname û kerameta wî/wê yan koma wan (ja ew kom neteweyî be an olî yan her komek be) nehatiye parastin. Ew maf û azadîya yêkek li armancên şoreşa «Jîna» e. Eger kesek yan komek bixwaze xwe pişikdar yan xwediyê armancên wê şoreşê bizanibe, lê mafê çarenûsa xelkên din nepejirîne, tê wê wateyê ku ew dijî wê şoreşê e û ew berevaniyê li desthilatdariya heteronom a neteweya xwe dike.

Parastina wê desthilatdariyê jî bi ew forma ku niha heye û neteweya serdest ced dike bo parastina wê, berewajî mafê jiyanê, mafê jin û azadîya xelk û neteweyên kolonîzebûyî li Îranê de heye. Desthilatdariya heteronom di derbarê mafê diyarkirina maf û erkên kesên din de ye. Yanî neteweya serdest û hikûmeta navendî mafê wê heye ku maf û erk bo neteweyên din diyarîbike.

Lewra eger em bixwazin li ser esasê tecribeyên heta niha heyî, bi awayek bêaliyane û abjektîv wê meseleyê binihêrin, dixuye ku erk û mafê ku neteweya serdest bo neteweyên wek kurd, belûç, azerî û … destnîşan kirine, ewaye ku bi helandina xwe di nav neteweya serdest de, hebûna xwe tune bikin. Tunebûna wan neteweya mafê jiyana wan destbeder dike. Ew yeka jî berevajî parastina keramet, azadî û jiyanê e.

Li nik neteweya serdest, mirandina ruhê netewî cem xelkê din, bi pêşmerca parastina jiyanê tê hesibandin.

Bes eger mafê çarenûsê û azadî bi giştî (azadîya siyasî, azadîya takekesî, dadperwerî) hemû bi hevre neyên pejirandin, dixuye ku mafê jiyanê jî nehatiye pejirandin.

Bi armaca gihîşin bi armancên şoreşa «Jîna»ê pêdiviye ku neteweyên bindestê Îranê xak, çand, ziman, hîs û hemû hebûna xwe dekolonîze bikin û li wan hevpeymanetiya de beşdar bin ku armanca wê dekolonîzasyon e.

Dekolonîzasyon têgeh û çemkek e ku berxwedana li hember kolonîzasyonê bi awayê cihêreng şirove dike. Ew têgeh wê yekê dipejirîne ku civaka îroyîn di bin sîbera kolonîzasyonê de pêkhatiye û pêdiviye ew şêweya nêrîn û hizrkirinê ku li bin bandora kolonîzasyonê de pêkhatine, werin guhertin. Ew guhertina dibe li aliyê herdu aliyê «serdest» û «bindest» pêwîst were dîtin da ku bikare herdu aliyan bi maf û erkên wekhev di hevpeymanetiyekê de bicivîne û bîne rex hev. Tenê li rewşeke han de ye ku herdu alî dikarin siberojeke azad, tijî bextewerî û pêşveçûn bo civakê destber bikin û esasê civak û pergala nû li ser wekhevî û dadperweriyê awa bikin û hevsengîyekê pêk bînin ku sînorê navbera çêyî û xirabiyê bi rengek xurt bide xuyakirin.



میثاق حق زندگی

فراخوان برای اعلام میثاق با هدف دفاع از «حق زندگی»

**۱۵ تشکل سیاسی، حزب و ائتلاف دموکراسی‌خواه (شامل ۳۲ گروه اپوزیسیون) متن «میثاق حق زندگی» را همزمان به صورت جداگانه و انفرادی منتشرکردند و خود را به آن متعهد دانستند.**

گفتنی است متن منتشرشده از سوی تعدادی از این گروه‌ها، دارای تفاوت‌های جزئی است که برآمده از تفاوت نگاه این گروه‌ها نسبت به مسأله‌ی هویت مرکز-پیرامون است. همچنین در متن برخی از گروه‌ها از واژگان متفاوتی برای نامیدن حکومت فعلی و آینده‌ی ایران استفاده شده است. از آنجا که رسالت این میثاق حل مناقشه‌ی هویتی مرکز-پیرامون نیست، همچنین ادبیات و صورت‌بندی کلامی تغییر جمهوری اسلامی، در اصل محتوای میثاق تغییر زیادی ایجاد نمی‌کند، کمیته کارزار «میثاق حق زندگی» خود را ملزم به انعکاس اخبار مربوطه می‌داند و از متعهدان به هر سه متن مشابه قدردانی به عمل می‌آورد.

اسامی ۱٤ ائتلاف، حزب و تشکل سیاسی به این شرح است:

۱- اتحاد جمهوری‌خواهان ایران
۲- جبهه مردمان ایران
۳- جبهه ملی ایران ـ اروپا
٤- حزب چپ ایران
۵- حزب دمکرات آذربایجان
٦- حزب دمکراتیک مردم ایران
۷- حزب مشروطه ایران (لیبرال دمکرات) **
۸- سازمان فدائیان خلق ایران (اکثریت)
۹- سازمان‌های جبهه ملی ایران در خارج از کشور
۱۰- شورای مدیریت گذار
۱۱- شورای ملی تصمیم
۱۲- کنگره ملیت‌های ایران فدرال*
۱۳- نقشه راه برای دموکراسی در ایران
۱٤- همبستگی جمهوری‌خواهان ایران
۱۵- همبستگی فراگیر برای آزادی و برابری در ایران*

*تغییرات در متن منتشر شده از سوی این گروه ها به این شرح است:
۱- تغییر عبارت "تعلق اتنیکی" به "تعلق فرهنگی، زبانی و ملیتی"
۲- تغییر عبارت « دوره‌ی مبارزه با حکومت حق‌کش ولایی، در جریان گذار و در دوره‌ی پس از آن» به عبارت « دوره‌ی مبارزه برای تغییر کلیت (سرنگونی) حکومت "جمهوری اسلامی" و پس از آن تشکیل نظام سیاسی دمکراتیک جایگزین»
**تغییر در متن منتشر شده از سوی حزب مشروطه ایران به این شرح است:
تغییر عبارت "تعلق اتنیکی" به "تعلق به خانواده اقوام ایرانی"

Kesek yan alîyek ku armanca wê damezrandina pergalek qenc li ser esasa maf û azadîya merivan be, hejmûnxwaz nabe. Kesê han li destpêkê de kerameta merivan re buha û qîmetê datîne. Keramet li ser bingeha naskirina fermî a dualîyane ye. Kesek ku naxwaze qebûl bike ku kurd, azerî, belûçê, ereb û … di Îranê de netewe ne û wan bi keyfa dilê xwe bi qewm, êl yan eşîr binav dike, ew tinaz û henekan dike û mafê jiyanê jî bo endamên wan neteweyan bi rewa nizane. Eger îro basa mafê jiyanê dike, liber hidnêye ku hêşta ciyê pê xwe qahîm nekiriye û hêz û desthilat tune ye. Eger pêşerojê de desthilatdariya heteronom bikeve destê wan,yê di encama pêdagirîya me li ser maf û azadîya me ya neteweyî, yê tenê mafê kolebûnê bo me bi rewa bizanin.

**Encam**:

Neteweya kurd ku îrorojê pêşengê şoreşa azadîxwazîyê di Rojhelata Kurdistanê û hemû Îranê de ye, armancên xwe li dirûşma «Jin, Jîyan, Azadî» de formûle kiriye û ew dirûşma bûye dirûşma hemû xelkên azadîxwaz li Îranê de. Partî û sazîyên kurd ku bi dehan sal xebat û têkoşîn li pişt wan e û xwediyê pêgeh, bandor û kartêkerî di civakê de ne, nabe û nikarin wê sermaye û krêdîya xwe bo partî û komên biçûk û oportonîst xerc bikin ku me bikin derence û pêlekan û li ser hisaba me xwe bigihînin desthilatê û dûre jî bi awakirina pergalek dîspotî û tûtaliter dîsa maf û azadîya me zevt bikin.

Em nabe qet tecribeyên Hikûmeta herêma Kurdsitanê jibîr bikin û tenê bi hindê razî bin ku qatilê xwe biguherin.

Me dehan sala xebat kir heta me rûyê reş ê rêjîma Xumeynî bi dinyayê da nasandin. Em nabe karekê bikin ku bi dehan sala dîsa xwînê bidin heya rûyê reş ê kesên din eşkere bikin. Kesên ku me û mafên me bi fermî nas nekin, nabe em her tewî wan kom bin; ja bila pêkanîna hevpeymanetiyê jî li cihê xwe bisekine.

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Bane: Kolberek ji ber gulebarana leşkerên dewletê jiyana xwe ji dest da

Êvariya roja Pêncşemî 12`ê Gelawêjê, kolberek bi navê "Hoşyar Emînî Dûsîne" kurê Mihemed xelkê gundê "Dusîne" ya Banê, ji aliyê leşkerên dewletê ve hat gulebarankirin.

Li gor çavkaniyeke agehdar, ev kolber piştî ku ji sînorê "Hengejale" ya bajarê Banê vedigeriya, li xala kontrolê ya Xorî Abadê, ji aliyê leşkerên dewletê ve rastî golereşandinê hat.

Vê çavkaniya haydar her wiha got: Leşkerên hikûmetê bêyî haydarkirinek berê li ser xala pişkinînê ya "Xorî Abad" di gel komek kolberên dane ber goleyan.

Vê çavkaniya haydar diyar kir: Leşkerên hikûmetê ev kolber di dema ku ti bar hilnegirtine kirine armanc.

Vê çavkaniya haydar got: Hoşyar Emînî Dûsîne bi sedema ketina gulleyekê li serê xwe canê xwe ji dest da.

Piştî vê bûyerê Hoşyar Emînî Dşsîne bo nexweşxaneya Selahedîn Eyûbî Banê hat veguhastin û termê wî roja Înê 13ê Gelawêjê radestî malbata wî hat kirin.

## Li sînorê Newsûdê kolberê xelkê Ciwanroyê birîndar bû

Roja Pêncşemî 12'ê Gelawêjê kolberekî bi navê "Mêhran Ehmedî" xelkê Ciwanroyê bi gulebarana leşkerên dewletê li sînorê bajarê Newsûdê birîndar bû.

Leşkerên dewletê bêyî hişyariyek berê rasterast gule li wî kolberî reşandin û di encamê de dest û pişta wî birîndar bûn.

Ev kolber ji bo çareseriya pizîşkî birin navendên tenduristiyê.

## Piştî ku hêzên ewlehiyê li ser rêya Sine-Merîwanê teqe li malbata çalakvanê sivîl Pûriya Ehmedî kirin, ev binçavkirin

Roja Sêşemî 10'ê Gelawêjê hêzên Îtla`ata Sinê li ser rêya Sine – Merîwanê teqe li otombêla çalakvanê sivîl Pûriya Ehmedî kirin û piştî rawestandina otombêlê û hevjîna wî Sehar Ehmedî û Barzin Ehmedî, kurê wan ê biçûk binçav kirin.

Li gor çavkaniyeke haydar bo Kurdpayê, hêzên ewlekarî piştî lêdana Pûriya Ehmedî û Sehar Ehmedî, li gel zarokê van yê biçûk ev bi hevre binçavkirin û bo girtîgeha Îdareya Îtilaata Sinê veguhastin.

Vê çavkaniya haydar diyar kir: Roja Çarşemî 11`ê Gelawêjê hêzên ewlehiyê gazî malbata Ehmedî kirin û zaroka biçûk ya vê malbatê radestî wan kirin.

Vê çavkaniya haydar got: Hêzên ewlehiyê roja Çarşemî 11`ê Gelawêjê, avêtine ser mala Pûriya Ehmedî û piştî lêgerîna malê, dest danîne ser hinek kelûpelên wan ên şexsî û bi xwe re birin.

Heya dema belavbûna vê nûçeyê, ti zanyariyek derbarê sedema binçavkirin û tohmetên derbarê Pûriya Ehmedî û Sehar Ehmedî de nîne.

Pûriya Ehmedî jî roja 1ê Reşemeya 1397an ji aliyê hêzên Spaha Pasdaran li Sinê hatibû binçavkirin û piştî 15 rojan ji lêpirsînê li girtîgeha vê rêxistina ewlekarî, bi danîna barimte hatibû berdan.

Ehmedî roja 21ê Banemera 1398ana Rojî careke din ji aliyê hêzên Îtla`ata Sinêê ve hatibû binçakirin û piştî 10 rojan ji lêpirsînê li girtîgeha îtla`atê, bi danîna barimteya 300 milyon Tûmenî hatibû azadkirin.

## Li Merîwanê welatiyekî ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hat binçavkirin

Sibeha roja Çarşemî 11`ê Gelawêjê welatiyê bi navê "Alan Erdeşîrî" xelkê Merîwanê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hat binçavkirin û bo cihekî nediyar hat veguhastin.

Li gor çavkaniyeke agehdar, hêzên ewlehiyê bêyî pêşkêşkirina belgeya dadgehê avêtine ser mala malbata vî welatiyê han û bi tundûtîjiyê ew binçavkirin.

Heya dema belavbûna vê nûçeyê, derbarê sedema binçavkirin û tohmetên Alan Erdeşîrî de ti agahî nehatine bidestxistin

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (451)




## 78 Sal Xebat Û Tekoşan

## Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê

25ê Gelawêjê 2645 - 2723'an a Kurdî

**Pîroz be 78 sal xebat di pêxema armancên mirovî û neteweyî yên gelê Kurd de**